TEROR LI SER BINEMAYÊ NASNAMEYÊ ÇI DIGEHÎNE?!

Bişar Kîkî *

Mêjû xwe li Îraqê dubare dike belê, ji bo hindê ku em mifayî jê werbigirin û nekevin di çewtiyên berê de. Duristkirina Îraqê ji layê Birîtaniyayê ve ji bo petrolê bû, rayê îraqiyan ne hatibû wergirtin û hizr bo vê pêkhatinê ne hatibû kirin. Padişahek hanîn û kirin serê desthelatê û ew bû ku bi şêweyek nesiroştî zû ji nav çû. Dîroka Îraqê ya pirr nexweşî û nearamiya siyasî, zîncîra kudetayên eskerî heya şerê Emerîka dijî terorê li ber çav ne hatibû girtin. Çunkî di bazineyê berjewendiyên zilhêzên cîhanî de bû zêdebarî faktorê herêmî belê faktorê navxweyî jî nahê jibîrkirin ku pirraniya dîroknas û siyasetmedaran egerên lawaziyê bo vî hokarî dizivirînin.

Verêjên cîhangêriyê, sîstemê nû yê cîhanê û şerê dijî terorê, kêşeyên neteweyên bindest berçav kirin û gelek kêşe hatin çareserkirin û gelekên din jî ber bi çareseriyê ne û ji wan jî bêguman kêşeya Kurdî ye. Ji bo nehêlana rijêmê Seddamî, berjewendî berbelav bûn. Belê, siroştê milmilanê di nav pêkhatinên Îraqê de, ev welat e ber bi Îraqek Federal birin. Egerna, ev Şî´eyên îro bi rijdî daxwaza federaliyê dikin, herçende li destpêkê ne li gel bûn. Û Sinneyên îro jî danpêdanek şermînan e bi federaliya Kurdistanê dikin, nizanin çi nav lê bikin û ji peyva (îtîhadî) jî tezîng leşê wan digire.

Milmilanêya siyasî li Îraqê milmilanêyek dîrokî ye, mîna agirê di bin kadûnê ve û hêdî hêdî ba lê dide û pelên wî sor dibin (zîncîra

trumbêlên T.N.T kirî, kujtin û teror kirin.) Lê, nasnameya terorê li Îraqê temam cuda ye û diçe ji dervey nasnameya dînî, şaristanî (milmilanêya şaristaniyan.) Xelk xelkekê dikuje, bi wekalet û nizane jî kî ne û qurban jî hêbetî ne, çunke bêhtiriya wan ne siyasî ne, belê, bi hukmê jî û ezmûna xwe bûne faktorekê giring yê siyasetê. Di vê hevkêşeyê de, Kurd ketine beramber terorkirinê li ser nasnameyê, di demekê de ku Kurd li nasnameyek nîvdewletî digerin li çerxê lêgeryan li pey nasnameyê.

Li Îraqê, Kurd di şerê dijî terorê de, şirîkê êkê ye bo Emrîka û cîhana azad. Dîsan Kurd navbijîvanê Şî´e û Sinneyan e. Di vê hevkêşeyê de hindî navmaliya Kurdî bi hêz û xurt be hind ev role mezintir û kargêrtit dibe. Kurdan divê projeyekê stratîjî yê berhevkirî hebe ji bo ragehandina dewleta Kurdî, çinku merc nîne Kurd li çarçûveyê Îraqê de bimînin, berdewamiyê bi vî rolî bidin û acêndeyên armancên Kurdan ji yên Şî´e û Sinneyan temam cuda ne. Em qet nabin biramezinên wan. Divê sînorek bo kujtina Kurdan li ser nasnameyê bihê dahînan nexasime li Mûsilê û dikare bibe kartek mezin di destê kurdan de.